H. C. Andersen

Wergêran / Firat Cewerî

Mirov nifûsa hemû welatên Skandînavyayê, ango Swêd, Norvec, Danîmarka, Fînlandiya û Îzlandiyayê dabihîne ser hev bi qasî nifûsa Kurdistanê nabe. Welatên Skandînaviyayê biçûk in, lê di warên aborî, siyasî, kulturî, edebî û teknîkê de li dunyayê xwediyên rolên mezin in. Xelatên edebiyatê yên herî mezin mîna xelatên Nobel û Astrid Lindgrenê li Skandînavyayê dihên belavkirin; fîlosof û nivîskarên mezin yên mîna Kierkegaard, Ibsen, Strindberg ji Skandînavyayê derketine; markeyên telefonan yên mîna Nokia û Ericsson yên Skandînavyayê ne û ez dikarim bêyî dudilî bibêjim ku xwandina edebiyatê jî li Skandînavyayê di radeya herî bilind de ye.

Li vî kujê cîhanê qîmeta gotinê heye, qîmeta gotina nivîskî bêhtir e. Ez dixwazim bi vê gotinê mijarê bihînim ser Hans Christian Andersenê danîmarkî. Min bi xwe cara pêşî di sala 1980-ê de bi çîroka "Keçika kibtîrfiroş" H. C. Andersen nas kir. Ez hingî xortekî nûhatî bûm, nû li Swêdê bi cih bibûm û bi armanca fêrbûna zimanekî nû min dest bi xwandinê kiribû. Mamostaya me ya zimên, di xelasoka dibistanê de, nêzîkî sersalê ji me re ew çîrok bi deng xwendibû. Min jî hîngî, ji nû çîroka xwe ya bi navê "Boyaxkerê solan" qedandibû, ji ber ku gernasê min Osmankê zarok ji ber efserên belediyê reviyabû û ketibû ber otomobîlê, ez têra xwe li ser giriyabûm û niha jî "Keçika kibrîtfiroş" ya H. C. Andersen dilê min perçe kiribû. Min ji çîroka H. C. Andersen ewqasî hez kiribû , min xwaztibû ez tavilê wê werbigêrim kurdî û bigehînim hevwelatiyên xwe. Lê, piştî salan, gava ku min rûpelên kovara Mîr Celadet Alî Bedir-Xan *Ronahî* di ser hev re qulipandin, ez di nava rûpelên kovarê de pêrgî çîroka H. C. Andersen "Keçika kibrîtfiroş"

hatim. Xwedêyo, ez hîngê çiqasî kêfxweş bûm. Camêrekî bi nave Bişarê Segman ew çîroka hezkira ber dilê min, di sala 1943-yê de, di hejmara Ronahiyê ya 19-ê de weşandibû. Gava min di sala 1992-yê de Nûdem derxist, min ew wergêra Bişarê Segman, ku paşî min fêhm kir ku Celadet Alî Bedir-Xan e, di hejmara Nûdemê ya duyê de li gel wêneyekî H. C. Andersen yê mezin weşand.

Ew çîroka H. C. Andersen li ser keçikekê ye, li ser keçikek feqîr ku bi firotina kibrîtan debara xwe û malbata xwe dike ye. Keçika biçûk şeva sersalê radihêje elbika xwe ya kibrîtan û li kuçe û kolanên bajêr digerîne. Sersal e, dunya sar e, berf li erdê ye; keçika biçûk dicemide, sar e, dixwaze xwe germ bike. Ew pêşî darîkekî vêdixe û destê xwe germ dike, lê li ber qefilandiye. Bi vêxistina her darikekî wêneyekî xweş dihê ber çavên wê. Wêneyê pêşî sobeke çînî ye. H. C. Andersen wêneyê pêşî welê salix dide, (bi wergera Bişarê Segman): "Sehwirîn dîtin. Digot qey li ber sobeke çînî û li ser doşekan rûniştiye. Çiqas lê germ bibû! Kir ko lingê xwe jî bêxe ber wê sobê, wan jî germ bike. Lê sobe ji nişkekê ve winda bû. Kibrît vemirî bû. Li destên xwe nêrî. Tiştekî di nav tiliyên wê de reş dikir…bizotê kibrîtê."

Keçika kibrîtfiroş kibrîteke din vêdixe, bi vêxistina kibrîta duyê re, mîna ku bînahiya wê di dîwêr re biçe û bigehe saloneke mezin. "Di orta salonê de maseke xwarinê xuya dikir. Li ser masê, di nav lengerîke isfehanî de qazekî birajtî hebû: kêr li pişta wî daçikandibûn. Niho, wê bihatana, bi kêrê ew perçe bikirana û li mêvanan lêk vekirana. Lê, welê nebû. Qaz xwe ji ser masê zer kir, daket erdê û berê xwe da keçikê…Kibrît vemirî. Di pêşiya keçikê de ji dîwarekî sitûr pê ve çi tişt nema bû."

Dunya sartir dibe û keçika biçûk her kibrîtên xwe vêdixe. Di vêxistina kibrîta dawî de ew êdî dike vê dunyayê li dûv xwe bihêle û bi ruha xwe ya teze ber bi asmanan ve bikişe. Ew, vê carê dapîra xwe ya mirî dibîne. Dapîra wê pê re digirnije, destê xwe dirêjî destên wê yên biçûk dike û bi wê re ber bi asmanan bi rê dikeve.

Gava sibehê zû şêniyên bajêr radibin, dibînin ku keçikek biçûk pişta xwe sipartiye dîwarê kuçê, kenek li ser rûyê wê ye, di nav tiliyên wê de darikê kibrîteke vemirî reş dike û elbikeke vala li ber cendekê keçikê ye.

Ev zêdeyî sedsal û nîvekê ye ku H. C. Andersen geh me digirîne, geh me dikenîne û geh jî me difikirîne.

H. C. Andersen jî mîna "Keçika kibrîtfiroş" ji malbateke hejar e û zarokiya wî jî bi hejarî borî. Ew di sala 1805-ê de li bajarê Odense, li Danîmarkê wek lawê solçêkerekî hatiye dunyayê. Ew zarokekî pir cihê, ne weke zarokên derdora xwe bû. H. C. Andersen di kitêba xwe ya bi navê "Serpêhatiya jiyana min" de dibêje ku wî bi zarotî kêm caran bi zarokên din re dileyizt, wî dixwazt ew bi tenê bimîne û gava bi tenê dima, dadigeriya cîhana xwe ya hundirîn û ji xwe re di wê cîhanê de jiyanên rengîn ava dikirin. Herçiqas di jiyana wî ya naşîtiyê de hin kar derketin pêşberî wî jî, lê wî bala xwe berdabû ser navdariyê û dixwazt bibe navdarekî nemir. Wî rêka navdariyê di perwerdeya teyatroyê ya Kopenhagenê de didît. Lê navdarî ne ewqasî hêsan bû. Heta ku ew ket ser rêka navdariyê serê wî li gelek kevran ket. Lê, bûrsa ku wî bi alîkariya hevalekî xwe î bi navê Jonas Collin ji aliyê qiralgehê ve bi dest xist, bû bingehê guhorîna jiyana wî û destpêka navdariya wî ya paşerojê. H. C. Andersen bi wê bûrsê dest bi xwandina lîseyê kir û paşî derbazî zankoyê bû. Ji vir û pê ve ew ket ser rêwîtiya nivîskariyê. Wî bi nivîsandina çend helbestan û weşandina romanekê kir ku li hin derdoran behsa navê wî bihê kirin, lê belê hêj ew nebibû navdarê di xeyala xwe de. Deriyê navdariya rastîn di sala 1835-ê de li ber wî vebû. Wî di wan salan de keşfek kir, dest havêt forma hunerekê ku heta hîngê anonîm û kolektîv bû, ew bi awa û fantaziyên xwe hûna, ji bêjeriya bi devkî derxist û derbazî kaxezê kir. Wî heta bi dawiya jiyana xwe li dor sed û pêncî çîrokên kurt û dirêj nivîsandin. Û ew ne bi helbest û romanên xwe, lê bi çîrokên xwe navdar bû. Herweha ew ne pişti mirina xwe, lê di dema zindîbûna xwe de navdar bû. Ew navdar, niha, pişti mirina xwe dîsa li dunyayê zindî bûye; lê sînorên Danîmarkayê gav kiriye û bûye cîhanî.